

Divê lez di danûstandinên Kurdî Kurdî li Kurdistana Sûriyê bê kirin

Kurdistan Egîd Mehmûd



Ev demeke behsa destpêkirina qonaxa duyem ya danûstandinên Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS û

Partiyên Yekîtiya Niştîmanî tê kirin, lê bêdengiyek di vê derbarê diyar e û ti aliyek behs nake. Lê welatîyên Kurdistana Sûriyê li hêviya wê

yekê ne ev prosêsa bighêje serî. Canda Emîn wiha li ser vê mijarê dibêje: Rewşa niha ya Kurdistana Sûriyê gelekî dijwar e û pêwîstiya vê rewşê

bi yekrêziya di nava mala Kurdî de heye da ku xelk bi hesanî jiyana xwe dûrî êş û azaran derbas bikin, ji berk u dijmin sûtê ji ne yekrêziya

Kurdan dibîne. Hozan Xelef jî wiha dibêje: Bi rastî xelk bi hewceyî jiyaneke xweş û nûçeyên xwe in û dive aliyên siyasî lezê di prosêsa

yekrêziyê de bikin û ti perçebûn û nakokî di navbera wan de nemînin, û êdî jiyaneke siyasî ya nû li Kurdistana Sûriyê destpê bike.

Korona

Li Kurdistana Sûriyê zêde dibe, û rewşa welatiyan jî zehmet e

Îmad Reşîd-
Qamişlo

Li Kurdistana Sûriyê roj bi roj rewşa tenduristî xerab dibe û hejmara pêketiyên vayrosa korona zêde dibe, û li gor ku rêveberên tenduristî eşkere dikin hejmara pêketiyên ji hejmara ku tê ragehandin gelekî zêdetir û ev yek jî zengilê metirsiyê lê died, lewma dive tedbîrên pêwîst werin wergirtin daku xelk bêhtir parastî bin, û dûrî vê nexweşiyê biçin. Mihemed Omer wiha li ser vê mijarê jî rojnameya Kurdistan re dibêje, heger hat û vayrosa korona gelekî zêde bû, wê demê de karesateke rasteqîne ya mirovî rû bide, û ti kes û aliyek jî nikare pêşiya wê bigre. Lewma dive tedbîr werin tundkirin, lê bi mixabinî ve qedexa hate rakirin ew jî bi tamamî, divê qedexa li ser qonaxan hatiba rakirin, ne bi awayekî yekser. Herwiha pêwîst e xelk xwebiparêzin û li hêviya ti aliyekî nemînin, û maskan jî li ser destê xwe durst bikin heger nikaribin maskan bikin, û pêwîst e desthilata heyî pirsgerêka maskan çareser bike û tedbîrên baş ji welatiyan deyne. Jîn Xalid wiha li ser pirsê Korona dibêje, em daxwazê ji xelkê dikin, civatên qelebelix pêkneyîn in û ji qelebalixê dûr kevin. Bêyî pêwîstî jî malên xwe dernekevin. Mask bikar bînin. Paqijiyê bidin pêş. Xwarinên, fêkiyên, hêşnahiyên, ku wîtamînen dewlemend dinav de ne bixwin. Hingiv bikar bînin. Ev hemû bergiriya laş pêş dixin. Xelkê


ku hest bi nîşaneyên Korona kirine, pêwîst e ji mala xwe dernekeve û pabendî rênmayan bibê daku xelkê zêde bi vê nexweşiyê nexê, û ev yek erkeki zehmet e li ser mile wan kesên nexweş, lê divê encamp bide û dûrî kalemêran biçê da ku wan bi vê vayrosê nexê. Berî niha Desteya Tendurustiya ser bi PYDê ve got, ku deriyên sînori û xalên kontrolê di bin çavdêriya wan de ne. Lê heta niha tiştê ku belav dibe, blavbûna vayrosa korona sedema wê deriyê sînori û firokxaneyên navdewletî ya Qamişlo

ne. Cuma Ebdulah wiha dibêje, bi rastî firokxaneyên Qamişlo ya navdewletî karesatekê jî bo deverê me re tine û dive sînorek jî vî dergehî re were dîtîn, heger na de mala deverên me xerab bibê û de vayros derbasî her maleke me bibê û tîmên tendurustiyê jî nema dikarin ti alikariyekê bikin û de rewş berev xerabûnê ve biçê, û de xelkê me li ser cadeyan jiyana xwe jidest bidin lewma pêwîst e çareseriyek ji vê yekê re were dîtîn û ti xemsarî di vê pirsê de neyê kirin ji berk u her xemsariyek

dê bêhtir karesat mezin bibê û de emê ezîzê berê dilê xwe jidest bidin. Nizanim çima Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê rewşa firokxaneyên navdewletî ya Qamişlo çareser nake, û edî rê li ber hatina vayrosa korona bigre û nehêle xelk derbasî Qamişlo bibin bê pişkinîn. Îlham Mihemed wiha dibêje, bandorên şer, kêmbûna ava vexwarinê, kêmbûna xwarin û dermanan, kêmiya elektrîkê, xirabûna rewşa aborî, jidestdana derfetên kar û zêdebûna bêkarîyê û bilindbûna

nirxên kelûpelan, her wek koronayê cihê dilgiranîyê ne bo wan milyonan kesên ku li deverên me dijîn. Herwiha vayrosa korona rewşa wan zehmetir kiriye, û ew nikarin bi dahatekî kêmtir xwebiparêzin yan dermanan ji xwe re bikin. Jiyana Seîd ku xelka bajarê Heseke ye wiha li ser mijara vayrosa korona dibêje, niha li bajarê me gelek zêde vayros belav bûye û ketiye di nava xelkê de û xelkê jî pirsê xweparêziyê piştguh kiriye, li aliyekî din av li bajarê Heseke nine

lewma xelk nikarin xwebiparêzin ji berk u paqijî de kêmtir be û xelk zehmtiyeke zêde dikşînin heta ku ava vexwarinê bidest bixin gelo de çawa ev xelk bikaribe xwe biparêze, dive aliyên peywendîdar çareseriyekê jî vê pirsgerêkê re deynin da ku xelk bikaribin baş xwe biparêzin. Jibîlî vê yekê welatiyên Kurdistana Sûriyê di rewşeke aburî ya xerab de dijîn û nikarin debara jiyana xwe û zarokên xwe bikin, lewma pêwîstiya wan bi alikariyên bilez hene daku rastî karesateke mirovî neyên, ev yek jî ji dezgehên navdewletî û Neteweyên Yekgirtî tê xwestin ku karekî baş di vê derbarê de bikin da ku xelkê ji bêavî û birçîbûnê rizgar bikin, û edî nehêle ku xelk rsatî karesatê were. Niha korona zêde bûye û roj bi roj hejmara miriyan jî zêde dibe, û ev rewş gelekî metirsîdar e ji berk u Kurdistanê Sûriyê kêmasiya amûrên tendurustiyê dikşîne, jibîlî ku amûrên henasdanê gelekî kêmtir e, û nirxê nexweşxaneyên taybet jî gelekî buha ye. Ya herî giring di vê demê de welatiyên Kurdistana Sûriyê bi her awayekî xwe biparêzin û dûrî qerebalixî û kombûnan bikevin û xwe nekin qurbaniya şaştiyan, û hewil bidin ku civak ji metirsiya vê vayrosê hişyar bibê, û civak xwe bi xwe hişyariyê di nava xelkê xwe de belav bikin da ku devera me ji korona paqij bibê û edî jiyana welatiyan mîna berê normal bibê û xelk bê pirsgerêk vegere ser karên xwe.



Xelkê Heseke ji nebûna avê dilgiran in û daxwaza çareseriyeke lezgîn dikin

Siyamend Elî-Heseke

Bajarê Heseke û derdora wê bê av in û di rewşeke gelekî zehmet de dijîn, xelkê vî bajarî bi hewceyî aveke paqij ji bo vexwarinê ye, û nabe ew vê dema dirêj bê av bimîn, lewma pêwîst e desthilata heyî bi awayekî lezgîn vî pirsgerêkê çareser bike. Li ser vî mijarê rojnameya Kurdistan nerîna welatîyên wî bajarî li ser nebûna avê wergirt. Di nava hersê mehên bihorî de, çendî caran Tirkîyê ava wêzgeha Elokê li ser nêzî 1 milyon kes li bajarê Heseke û derdora wî qutkirîye, û carcaran av bi rêjeyê gelekî kêmtir dibe, û çarcaran bajarê Heseke. Şiyar Elo wiha li ser mijara nebûna avê vexwarinê

li bajarê Heseke dike, mijara nebûna avê mijareke siyasî ye di navbera PYDê û Tirkîyê de û herdu alî ji hevdu tometbar dikin, Tirkîyê dibêje ku PYDê eliktîrîkê li ser Serêkaniyê û Girêsipî qut dike û PYDê jî red dike û yên ku zirarê dibînin jî bê guman xelkê sivil in ku zêdetirî yek milyon kes li bajarê Heseke dijî ku zêdetirî 300 hezar kes ji wan koçberên Serêkaniyê û Girêsipî ne ku niha li nava dibistanên Heseke dijîn û di rewşeke xerab de ne û pêwîstiya wan bi alîkariyên bilez in û ji nava wan jî dive av ji wan were peyda kirin di demeke nêzîk de. Xalid Hisên jî wiha li ser vî mijarê dibêje, Di demekê de, ku bi sedema eger û tirsê belavbûna Virusa

Koronayê, pêwîstiya xelkên Kurdistanê Sûriyê bi giştî, bi avê pak heye, Hikûmeta Tirkîyê û grûpên çekdar ên alîgirên wê, qutkirina avê weke fişarekê li ser PYDê bikar tîne, lê zirarê dibîne xelkê sivil ku

bûne qurbanê destê herdu alîyan, ya giring ew e ku di vî demê de çareseriyeke temam ji xelkê re were dîtin û êdî xelkê ji nebûna avê vexwarinê rizgar bibin. Di vî dema dawî de hejmareke zêde ji xelkê bîr kolane, lê avê wan

ji bo vexwarinê nabe, û tenê ji bo şuştinê dibe, lewma ev jî ne çareserî ye. Jan Omer jî wiha dibêje, heger hat û nebûna avê bi vî şeweyî berdewam bibe rewşa xelkê gelekî zehmetir dibe, îsal xelkê me havîneke

şewat derbas kirin ku ev yek jî li ser serê wan bû barekî giran, bi rastî ev karesat nayê qebûl kirin ku niha tê serê xelkê me yê bajarê Heseke û dive di demeke nêzîk de ev pirsgerêkê were çareser kirin.



Cenga avê li dijî Kurdistanê



Idrîs Hiso

Bê çawa ev sed sal bûn, û heta niha, Kurd ji petrola welatê xwe bêpar û mehrûm in, û pereyên wê petrolê li dijî Kurdan bi xwe dihat bikaranîn, niha jî Kurd ji avê welatê bê par û mehrûm in. Ev maweyê nêzîkî mehekê ye, Tirkîyê û pêxwas û çeteyên ser bi Tirkîyê ve av ji ser bajarê Hisiça û gundewarên wê birîye. Xelkên Hisiça di nava karesetê mezî de dijîn, werzê havîne ye, û veyrûsa Koronayê li welat jî belavbûye

û rojane pêketiyên Koronayê li Rojavayê Kurdistanê zêde dibin. Di rewşeke wisa de pêwîstiya xelkê bi avê dibe duqatî rewşa asayî, di demeke wisa tengav de û ji destpêka ku Tirkîyê Serê Kaniyê dagîr kiriye avê wek çek li dijî sivilan bikartîne. Lê îsal ne wek her salê xelkên bajarê Hisiça û gundewarên wê ji kêmbûna avê dinalin, sedema wê yekê jî ew e ku Tirkîyê û çeteyên ser bi wê ve av westgeha Elokê ku jêdera serekî ji avê Hisiça re ye birîye. Tê gotin ku Tirkîyê û çeteyên xwe vî yekê dikin da ku fişarê li Rêveberiya Xweser bikin ku Eliktîrîkê bo wan bişîne Serê Kaniyê û deverên di bin dagîrkeriya wan de. Dibe ev armanceke demkî be ji bo Tirkîyê, lê armanca Tirkîyê ya serekî û stratîjîk

ew e ku herêmê ji xelkê wê vala bike, bi taybet ew aliyên ku stemkariya Tirkîyê li ser xwe qebûl nakin bitaybet gelê Kurd û pêkhatiyên resen yên Rojavayê Kurdistanê, Tirkîyê dixwaze Rojavayê Kurdistanê ji pêkhatiyên resen vala bike, û li cihê wan çete û pêxwasên xwe bicih bike, lewma Tirkîyê amade ye ku tenê avê ji ser xelkên Rojavayê Kurdistanê qut bike, lê belê bidestê

wê ba wê ba jî qut kitiba. Di heman demê de jî biryarên çewt, neqûl kirina ti aliyekî din ji aliyê Rêveberiya Xweser, bitenê xizmeta armancên Tirkîyê dike, wek biryara parastinê û birêvebeirina samanên kesên nediyar û penaberan û xenî wan jî. Ti çare li berdem Rêveberiya Xweser û gelê Rojavayê Kurdistanê bigiştî nîne ji bilî ku yekrêziya nav

mala xwe biparêzin û bi zûtirîn dem bighên rêkeftineke giştî û cîgir di encamê wê de Pêşmergeyên Rojvegerin, hilbijartinên rewa bi çavdêriya rêxistinên civaka sivil, Herêma Kurdistanê û Neteweyên Yekbûyî heger bidestket werin kirin, û di encamê de hikûmetek ku nûnertiya hemû alîyan bike were avakirin, asta jiyana xelkê û çînên civatê were baş kirin û gendel werin

girtin û ciza kirin. Wê demê dibe ku dengê pêkhatiyên Rojavayê Kurdistanê bigihê cihanê û xelkên Rojavayê Kurdistanê jî bi wê yekê hest bikin ku êdî ew bi piştevaniya bereyê Kurdistanê li hev kirî û bihêz dikarin baştir di ber xwe bidin û şer jî bikin. Lê aya Rêveberiya Xweser û hêzên ku li Rojavayê Kurdistanê hene deng û bangewaziyên wisa dibihîzin? Heyhat.



Referandoma Kurdistanê

Şiyar Alyanî

Bîst û pêncê êlûnê
elenda serxwebûnê
ev Roj li kurda pîroz bê
herdem cejn û Newroz bê
wê kurdistan azad bê
bextewar û aram bê
ev Roj bo me zayîne
derfeteke zêrîne
bernadin vê derfetê
avabikin dewletê
werin dengê xwe bidin
ji destê xwe bernadin
bi hev re werin dengdanê
bikin sema û dilanê
bo Roja dayîk bûnê
azadî û serxwebûnê
îro ev Roja meye
dewletbûn doza meye
vaye roka me hilat
bayê dêrana me hat
ev Roj Roja kurdaye
Xewna bav û kalaye
ji keda qurbanîya
derfet li ber deriye
Ji berhemê pêşmerge
qehreman û lehenga
Liser me şer û cenge
rabin serxwe derenge
serok Mesûd hêjaye
xweşteviyê kurdaye
beryara te rewaye
zirtê neyara baye
asêne liber bahozê
li ser rêbaz û dozê
Ji tera tev dibin sozê
gemiye dîrkin ji pêla
ji bo tola Enfala
qurbanî bi sed hezara
li germiyan û Bezan
li helbçe û Balîsan
Kerkûk dilê kurdistan
li ser te dibin qurban
tuyî birîna giran
ala rengîn hildan jor
sînor danîn bi xwîna sor
Ji kurdare bû textor
êdî nema zilm û zor
derman dikê birîne
kovanê mem û zîne
Vaye xewnê me bi cî bûn
şin dibin gul û beybûn
cîhan tev ji me fêrbûn
welat li me kiribûn ar
derd û kûvan û xembar
payîz çû va bû buhar
nema qêrîn û hawar
wê zivirê wek ewil
awazê kew û bilbil
dîsa wê reş bin ji kil
ew çavê ku mane şil
Ji rondika bûne kul
êdî nema ye girî
wê li vir bê cejin û şadi
mizgîn li we va bû diyar
wê lime bê cejin û buhar
wê çin kovan û xembar
ji welat barkir neyar

Xwendina pirtûkan gelekî kêmbûye

Kurdistan- Beşîr Şexmûs

Li Kurdistana Sûriyê, asta xwendina pirtûkan gelekî daketiye. Sedema wê yekê jî xwendina bi elektronîkî û bilindbûna nirxên pirtûkan e, wek welatî dibêjin. Mihemed Elî li ser vê mijarê wiha dibêje: Di demên dawî de, rêjeya xwendina pirtûkan kêmbûye. Sedema vê jî rewşa giştî û kêmbûna derfetan û guvaşên derûnî yên li ser mirovan e, herwiha pêşketina tehenolojiya jî bandoreke gelekî zêde li ser vê yekê kiriye, lê divê xelk guh bidin xwendina pirtûkan û dev ji serêşîya tehenolojiya berdin." Can Xelef jî dibêje, ji ber vayrosa korona çalakîyên rewşenbîrî gelek kêmbûne ew jî ji ber metirsiya vî vayrosî, lê berî niha jî xwendina pirtûkan li Kurdistana Sûriyê kêmbûye. Cemîn Reşîd jî wiha dibêje "Niha heskirina xwendinê li gel xelkê kêmbûye, tehenoloji sedemê serekeye ji bo vê kêmbûna xwandinê. Lê xelkê Ewropa xwendina pirtûkan li cem wan gelekî pîroz e û ti carî jî dev ji vê xwendinê bernadin ji ber ku li cem wan xwendina pirtûkan giring e. Ez

dibêjim di salên 90an de xwendina pirtûkan li Kurdistana Sûriyê gelekî ji niha zêdetir bû, tevî kêmbûna pirtûkan û kêmbûna derfetan ji bo xelkê me ku di jiyaneke zehmet de jiyana xwe derbas dikirin. Şoreş Husên jî wiha li ser mijara xwendina pirtûkan dibêje, heger hat û piştevanî hate kirin û navendên xwendinê li Kurdistana Sûriyê zêde bibin wê demê ez bawer dikim xelk zêdetir bixwînin, û guh bidine xwendinê û dev ji tehenolojiyê berdin û êdî asta xwe ya rewşenbîriyê zêde bikin, bi rastî bi xwendina pirtûkan mirov ji aliyê rewşenbîrî ve gelekî zengin dibe, û kesayetiya wî jî tê guhertin û dikare di nava civakê de karekî baş bike û miletê xwe jî pêş bixe, ji ber vê yekê li tevahiya welatên dunyayê piştevaniya xwendina pirtûkan dikin ji bo ku welatê wan pêşve bikeve. Îsam Xalid jî wiha li ser vê mijarê ji rojnameya Kurdistan re got: Di dema vayrosa korona de gelek xelkê me sûd ji vê derfeta zêrîn wergirtin û li malên xwe dest bi xwendina pirtûkan kirin û bi rastî

jî ev yek gaveke gelekî giring e, û ez pîrozbahiyê li wan dikin ku çawa karîna vê derfetê bidest bixin. Bi rastî dive ev yek were piştevanîkirin ew jî di rêya çêkirina pêşbirkên xwendina pirtûkan da ku xelk kêfxweş bibin, û bizane ku ev yek sûda wê heye, ev yek jî dive aliyên peywendîdar û partiyên siyasî bikin ji berk u derfetan wan hene û navendên wna jî hene, û bila ev navend jî bibin cihê xwendin û wêje û zanistê û tenê ne ji bo siyasetê be. Heger partiyên me vê yekê pêk bînin dê asta endamên wan jî bihêz bibin, herwiha civak jî bibin civakeke rewşenbîr û zane, û dê di rojên bê de alîkar bin ji bo her egerekê ku li Kurdistana Sûriyê rû bide.




Karekî hunerî li ser Efrînê hate belav kirin

Kurdistan- Hîn Xelîl

Karekî hunerî bi staylekî cewaz û cuda ku behsa êş û azarên xelkê bajarê Efrînê dike di jêr navê "Efrînê Evînê" hate belav kirin. Helbesta vî karê hunerî ya Nivîskar û helbestvan Ezîz Xemcivîn e, û dema vî karê hunerî jî 25 xulek e, ku dîmenên êş û azarên xelkê Efrînê li xwe digre. Ezîz Xemcivîn ku wî ev helbest nivîsandiye ji Rojnameya Kurdistan re got: Karê wan, karekî xwebexş e, herwiha helbest, stran û muzîk digel hin dîmenên tiracîdiya ku hatiye serê miletê Efrînê di nava vî karî de bikar anîne, û wan xwestiye dengê miletê Efrînê bighînin raya giştî. Di vî karî de her yek ji hunermend: Biraîm Kêvo-Gare Sazkar-Yara Hebîb-Firîşte Efrîn -Jîn Xelîl. Herwiha her yek ji muzîkjen: Ehmedê Çep-Mehmûd Horo-Hesen Gêncî-Kawa Kalê beşdar in, û Poster jî Şîlan Doskî

durst kiriye û helbesta vî karî jî ji bo zimanê Ingilîzî hatiye wergerandin ku ji aliyê Mihemed Xêr Bengo ve

hatiye wergerandin. Derhênerê vî karê hunerî jî Hunermend Zekerîya Efrîn e



1. Hunermend: Gare Sazkar
2. Hunermend: Yara Hebîb
3. Hunermendê ciwan: Firîşte Efrîn
4. Hunermendê ciwan: Jîn Xelîl
5. Muzîkjen: Ehmedê Çep
6. Muzîkjen: Mehmûd Horo
7. Qanûn: Hesen Gêncî
8. Bilûr-Dûdûk: Kawa Kalê
9. Wergerandina Ingilîzî: Mihemed Xêr Bengo
10. Helbest: Ezîz Xemcivîn
11. Çavdêrî û Derhêneriya muzîkê: Hunermend Biraîm Kêvo (Biraîm Kêvo)
12. Montaj û Derhênerî: Zekerîya Efrîn